

## Ji bazên azad re, birîn baskên firînê

Di dîroka bizava rizgarîxwaziya neteweyan de pir in gavên ku hebûn û wateya mirovbûnê ji nû ve pênase dikin. gavên ku êşa takekesî dibe sembola berxwedana gel.Di dîroka hemdem a Kurdistanê de ji, canfîdayên rêya azadiyê di vê rêye de derbas dibin û pêgeha mirovahî û mirovbûnê pênase dikin. Dom»R:10





## Ev proje, ji pêvajoya çareserîyê zêdetir, bawerîya ku pêvajoya mijûl kirinê ye xurtir

Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) Mustafa Ozçelîk roja 29.11.2025ê, li paytextê Danîmarkayê Kopenhagê semînerek li dar xist.Li gel rêvebir û endamên PWKyê yên li Danîmarkayê, nûnerên PDK (Partîya Demokrat ya Kurdistanê), PDK-Îran, HAK-PAR, PDK-Bakur, Komela Şoreşgerê Zahmetkêşanî Kurdistan, Partîya Demokrat a Kurdistan- Sûrîye, Partîya Demokrat a Pêşverû ya Kurd Li Sûrîyê (Partîya Pêşverû), Partîya Demokrata Kurd . . . . Dom» R:3

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (507) 06-12-2025*



## Gotinek Di 89 Saliya Rojbûna Prof Dr. Celîlê Celîl De Li Qamişlo

Wek ku diyare, Kurdistan bi çiyayên xwe, hem jî bi şoreş û serhildanên xelkên xwe navdar e...Û tevî qedexebûna zimanê kurdî, perçebûn û bindestiya gelê kurd, gelek lehengên bi nav û deng, di warê nivîsîna bi zimanê kurdî, hunandina helbestan, danheva folklor û weşandina kovar û rojnameyan de, di nav gelê kurd de hatine naskirin...Eger Bedirxanî di vî warî de ji pêşengan têne jimartin, belê gelek malbatên din jî hene, wan jî di bin şert û mercên çetîn û dijwar ..... Dom» R:9

# Hêz û helwêst ji ku çavkanî digre?



Dema ku kesek yan aliyek biryarekê dide, yan helwêstekê li hember tiştekê yan bûyerekê de digre, berê de ev gotine hatiye gotin ku dibêjin: Eva pişta wî bi çi yan kê germ û qahîm e wiha dibêje?

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li heyamê hemî temenê xwe yê 80 salî de hertim xwediyê helwêst û biryara xwe bûye û nekariye li hember çi tiştekê de ku li derdora vê diqewimin, bê helwêst be û bi hişmendiya xwe a siyasî û netewî, bi berhevdana xwe a serbixweyî a siyasî û biryar danê, biryar daye û helwêsta xwe ragihandiye.

Ger em wegerin bo hema pirsyara serve ku dibêjin bi çi û kê piştqahîme wiha dibêje, bê guman Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li hemî temenê xwe de, her ji roja avabûnê ve heya niha, heçî biryarek dabe û heçî helwêstek girtibe bera xwe, tenê û tenê bi piştqahîmî bi piştewaniya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, Siyaseta rasteqîne a xwe û îradeya bihêz a Kadr û Pêşmerge û Endam û alîgirên xwe bûye û bi serbilindî û bi îrade ve xwediyê biryar û helwêsta xwe bûye.

Hizbek ku xwediyê pêgehekî bê mînak li nava civatên xelkê Kurdistanê be, Hizbek ku xwediye siyaseta serrast be, Hizbek ku xwediya serbixweyî ya biryardanê be, Hizbek ku xwediyê dîrokekî pirşengdare pitir ji 8 dehik xebat û berxwedanê be û bi hemî dijvariyan û qonaxên sexte xebatê re derbas bibe, Hizbek ku xwediyê zêdetirîn Endam û Alîgir û Kadr û Pêşmergeyên xebatkar be, Hizbek ku vê bingeha gihandina dengê mafxwaziya gelê Kurd gihandibe cîhanê û niha jî dîplomasiya tev Kurdan li ser esasê heman bingehê berdewam dike, Hizbek ku baveriyekî kûr bi dêmokrasî û vekhevî û sikolarîzmê heye, Hizbek ku li pêxema armancên bilinde gel de bi hezaran şehîdan li rêka xebatê de dane û serweyî hemiyan Hizbek ku rêberên mezin ên wek Pêşewa û Qasimlo û Şerefkendî pêşkêşî rêka rizgariyê û armancên gel kirine, Bê guman hizbek dibe ku bi piştqahîmî û baverbixwebûnê ve hertim helwêstê bigre û biryarê bide.



## Mistefa Hicrî: Me amadehiyeke tevav bo berdewamkirina xebatê û heta xebata çekdariyê jî, heye

Îşare: Malpera Îngilîsîziman a “ Zî Amargî” hevpeyvînek digel rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê kiriye. Li vê hevpeyvînê de hinek bas û pirsyar li ser rojeva siyasî a niha ya Rojhilata Navîn û Îranê û karlêkerî û bandora vê bi ser pirsa Kurd li Rojhilatê Kurdustanê digel rêzdar Mistefa Hicrî hatine berbas. “Agirî” deqa Kurdî ya vê hevpeyvînê bo ve vediguaze.

**Piştî 7ê Octobera 2023 a Zayînî, Rojhilkata Navîn pê avête qonaeke dîrokiya nû ku tê çavrêkirin hevpeymanî guherîn bi ser de bên û baladestiya hêza deverî ya nû cih bigrin, bi taybet Erebistan û Îsraîl. Şirovekirina te yê rêzdar bo Rojhilata Navîn a nû û pêgeha Kurd li wan guherîênan de çiye?**

Her wekî te bi xwe îşare pê kir, hevpaymanî li Rojhilata Navîn de bi lezgînî guherîn bi ser de tê, lewma hêj rewşa siyasiya vê deverê, necihgîr e, lewma em bi hûrî nizanin ku guherîn rû bi çi aliyekê ve diçin, lê dûrdîmena deverê bi wan guherînên ji 7ê Octobera 2023 ve heta niha dibînin ku rû bi guherîneke kûr li vê deverê ve diçe û navenda vê guherînê, ez li guherîna rewşa komara îslamiya Îranê de dibînin.

Ev rêjîma ku ji destpêka hatina ser deshilatê li jêr siyaseta hinardekirina şoreşî bi xerceke malî û mirovî bi rêya milîsên ser bi rêjîma Îranê ên wek Hemas, Hizbullah, Hûsiyên Yemenê, rêjîma Beşar Esed li Sûriyê, bi bazinekî agirîn Îsraîl dorpêç kir, dest avête meyandina madên Navkî, hêza mûşekî û dironiya xwe roj bi roj berfirehtir kir ku bo 2 armancan bû, armanca yekem kawilkirin û jinavbirina Îsraîl û armanca 2ê dema ku ji aliyê aliyekî biyanî ve bikeve nav metirsî û gefan, wan milîsan wek berervanîker bi kar bîne.

Dom » R:2-3

## Daxuyaniya hevpar a bi hilkefta roja cîhaniya rawestan li hember tundûtîjiya dijî jinan

Dom » R:5



## 26 ê Sermawezê ew roj e ku roja Kurdistanê li dijî dagirkeran serket

Dom » R:7

# Mistefa Hicrî: Me amadehiyeke tevav bo berdewamkirina xebatê û heta xebata çekdariyê jî, heye

**Îşare: Malpera Îngilîsîziman a " Zî Amargî" hevpeyvînek digel rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê kiriye. Li vê hevpeyvînê de hinek bas û pirsyar li ser rojeva siyasî a niha ya Rojhilata Navîn û Îranê û karlêkerî û bandora vê bi ser pirsa Kurd li Rojhilatê Kurdustanê digel rêzdar Mistefa Hicrî hatine berbas. "Agirî" deqa Kurdî ya vê hevpeyvînê bo ve vediguaze.**



**Piştî 7ê Octobera 2023 a Zayînî, Rojhilkata Navîn pê avête qonaeke dîrokiya nû ku tê çavrêkirin hevpeymanî guherîn bi ser de bên û baladestiya hêza deverî ya nû cih bigrin, bi taybet Erebistan û Îsraîl. Şirovekirina te yê rêzdar bo Rojhilata Navîn a nû û pêgeha Kurd li wan guherîênan de çiye?**

Her wekî te bi xwe îşare pê kir, hevpaymanî li Rojhilata Navîn de bi lezgînî guherîn bi ser de tê, lewma hêj rewşa siyasiya vê deverê, necihgîr e, lewma em bi hûrî nizanin ku guherîn rû bi çi aliyekê ve diçin, lê dûrdîmena deverê bi wan guherînên ji 7ê Octobera 2023 ve heta niha dibînin ku rû bi guherîneke kûr li vê deverê ve diçe û navenda vê guherînê, ez li guherîna rewşa komara îslamiya Îranê de dibînin.

Ev rêjîma ku ji destpêka hatina ser deshilatê li jêr siyaseta hinardekirina şoreşî bi xerceke malî û mirovî bi rêya milîsên ser bi rêjîma Îranê ên wek Hemas, Hizbullah, Hûsiyên Yemenê, rêjîma Beşar Esed li Sûriyê, bi bazinekî agirîn Îsraîl dorpêç kir, dest avête meyandina madên Navkî, hêza mûşekî û dironiya xwe roj bi roj berfirehtir kir ku bo 2 armancan bû, armanca yekem kawilkirin û jinavbirina Îsraîl û armanca 2ê dema ku ji aliyê aliyekî biyanî ve bikeve nav metirsî û gefan, wan milîsan wek berervanîker bi kar bîne.

Heta bûyera 7ê October, rêjîma Îranê roj bi roj zêdetir hêz û hêjmoniya xwe berfireh dikir û bi taybet li Rojhilata Navîn de bibû gefek mezin. Amerîka û Ewropayê li vê heyamê de gelek hewl dan ku siyaset û reftara vê rêjîmê biguherînin, lê wan bûyeran, rojava jî anî ser vê baweriyê ku siyaseta rêjîma Îranê nayê guherîn, lewma bo kêmkirina şiyana rêjîmê li hemû waran de pêngavên praktîkî hilgirtin.

Niha komara îslamiya Îranê berewajiyê berî 7ê Octoberê bi taybet piştî êrîşa 12 roje ya îsal a îsraîl û Amerîkayê bûye welatekî şikestxwarî û bêhêz, derbên giran bi milîsên ser bi rêjîmê kevtine, hikûmeta Sûriyê ku xulamokê komara îslamiya Îranê bû, bi hikûmeteke dijî komara aîsamî guherî ku niha digel Îsraîlê danûstandinê dike bo vê yekê ku tevlî peymana Îbrahîm bibe, Lubnan ku li destê Hizbullahê de bû, niha digel hevpeymanan bo çekkirina Hizbullahê hevdeng bûye, berdewamiya vê pêvajoyê (bêhêzbûna rêjîma Îranê) bi bêhêzbûna hêjmoniya rêjîma Îranê dizanim û her çiqas ev hêjmûnî kêmtir û bêhêztir bibe, hivî îstiqrara zêdetir li Rojhilata Navîn de bihêztir dibe û sîbera şer li ser kêmtir dibe ku bi qazanca rûniştiyên vê deverê û hemû cîhanê ye.

Kurdistan jî ku li vê deverê de ye, bê şik li encama wan guherînan de dê qazanc bike bi wan mercan ku yekem siyasetên xwe, li rasteya wan guherînan darêje û Duyem li navxwe de li ser bernameyek niştimanî hevdeng bin û hev bigrin, hevdengiya Kurd li her beşekê de merca bingehîn e ku li encama wan guherînan de bo qazanca gel û niştîman e.

**Îran heta şerê 12 roje, wek hêzeke xwedî bandor a devera Rojhilata navîn reftar dikir, lê niha rêjîma Îranê li pêşxistina şiyana navkiya xwe hem şikest xwariye, hem hêz û milîsên ser bi rêjîmê bêhêz û bê bandor bûn, hem şiyana mûşekiya vê hatiye sînordarkirin, bi hizra te yê rêzdar, gelo Îranê dê bikare careke din wegere bo pêgeha xwe a berî 7ê Octoberê?**

Her wek li beşeke bersiva pirsyara yekem de min bas kir, ez wa dibînim ku niha piştî zêdetir ji 40 sal ceribandinên rêjîma Komara îslamiya Îranê ji aliyê welatên Rojavayî ve, êdî derfetê nadne rêjîma Îranê ku wegere rewşa berî 7ê Octoberê. Bi taybet ku gendeliya sîstematîk, kêmbûna wizeya berqê, kêmavî û xizmetguzariyên din ji aliyekê û daketina nirxa dirafê Îranê qeyrana bêkarî û teweroma hevdem digel tepeserkirina roj bi roj a zêdetir a azadiyan, kerb û bêzariyeke bê mînak li nav xelkê de li Îranê bi atybet netewên ne-fars pêk aniye ku ti baweriya wan bi rêjîmê nemaye, li asat herî serî ya desthilatê de jî, ew rewş niha bûye sedema pêkanîna dualîbûnekê ku bi aşkera bi dijî hev diaxivin.

**We li sala 2015 a Zayînî de "Rasan" ragihand û çend çalakiyên serbazî jî we kirin li demekê de ku li vê demê de rêjîma Îranê li asta xwe ya herî bilind a bihêziyê de bû, lê li wan çend salên derbasbûyî de, çi li dema şoreşa jînayê û çi li şerê 12 roje de we heta astekê xwe ji çalakiyên serbazî bi dûr girt. Ev xwedûrgirtina, biryarek siyasiya starytejîkiya yekalîker a vê yekê ye ku hûn naxwazin şerê çekdarî dest pê bikin, an hûn ber hindê amade nebûn, ji vê yekê xatircem nebûn ku eva dikin, renge tê de sernekevin?**

Me Kurdan an her yek ji netewên bindest bi atybet netewa Kurd li heyama temenê vê rêjîmê de zêdetirîn qurbanî li sekinin li hember rêjîmê de dane, lê ya rast ev e ku ti netewek bi tenê nikare rêjîmê biguherîne, bi taybet ku li derheq Kurdan de gelek kîn li dilê wan de hene, her tim amadeye bi her hêcetekê kîna dilê xwe bi ser Kurdan de birêje, lewma tevgera çekdariya me de xelkê gelek nirxên canî dida, lewma em dixwazin mil bi milê rûniştiyên li Îranê, xebata xwe, îca her cure xebatek bi dijî rêjîmê bebidomînin, neku hemû giraniya barê nirxdana bo guherîna hikûmetê bêxin ser milê gelê Kurd, lê tevî ku me amadehiya tevav bo berdewamiya xebatê, heta xebata çekdariyê jî heye, em li zêdekirina asta vê şiyanê berdewam in.

Rastiyek din jî li vê derheqê de ev e ku li vê serdemê de xebata medenî û rêkxiravî bi nirxdaneke gelek kêmtir a canî heye, lê karlêkerî û bandora vê zêdetir e û li civaka cîhanî de jî zêdetir tê erêkirin, lewma em niha zêdetir li ser vê cure xebatê kar dikin û geşê pê didin.

**Li heyama wan 2 salên derbasbûyî de Îran û Îraqê bi beşdariya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, çendîn lihevkirinên ewleh bo sînordarkirina Hizb û aliyê Rojhilatê Kurdistanê, wajo kirine. Piştî cibicêkirina wan lihemkirinan, çalakiyên Hizbên Rojhilatê Kurdistanê zêdetir hatine sînordarkirin, ma gelo metirsiya vê yekê li ser we nîne ku ev lihevkirinane we bi tevavî sînordar bikin?**

Eva çalakiyên Hizbên Rojhilatê Kurdistanê ku li wan lihevkirinan de heta niha hatiye sînordarkirin, çalakiya çekdarî ye, şêwazên din ên xebatê ji aliyê her yek ji wan aliyan ve pêka şiyan û bernameyên xebata wan bi rê ve diçin.

Lê komara îslamiya Îranê her bi vê yekê nesekine û givaşê bo ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Bexdayê aniye ku li wî welatî de cihê me nemîne, lê me berxwedan kiriye, ez gelek bi dûr dibînim ku ji vê paşve ku desthilata komara îslamî li hemû deverê û Îraqê de bêhêz bûye li vê derheqê de serkevtinê bi dest xwe ve bîne.

Dom » R:3

# Mistefa Hicrî: Me amadehiyeke tevav bo berdewamkirina xebatê û heta xebata çekdariyê jî, heye

Doma » R:2

**Bi balkêşandin bi qeyranên li pey hev ên Îranê, wa tê xuya ku rastî qeyran û bûyerên kûrtir bibe, wek mînak qeyrana avê. Gelo Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ti beranmeyek qahîm bo rûberûbûn digel paşhatên wan qeyranan amade kirine û li egera guherîna siyasiya li paşerojê, bernameya Hizbê bo beşdarêkirin li avakirina jêrxanên civakî-siyasî a Îranê çiye?**

Belê, me li kombûnên rêberatiya xwe de egerên guherîna desthilatê li Îranê de gengeşe kiriye û bo her guherînekê, me bernameyek bi wec diyarî kiriye û li ser kar jî dikin.

**Li heyama salên derbasbûyî de, Navenda Hevkariya Hizbên Rojhilatê Kurdistanê, tevî rexne, roleke girîng li rêkxcistin û rohnkirinên li ser daxwaziyên dîrokiya Kurd hebû, lê piştî serîhildana vê dawiyê, ev navend li piraktîkê de hilveşiya ye. Girîngtirîn astengên li ser rêya pêkanîna eniyeke yekgirtî li nav Hizbên Rojhilatê Kurdistanê de çine?**

Navenda Hevkariya Hizbên Rojhilatê Kurdistanê ku heyama 5 salan berdewam bû, pêngawên baş li pêşxistina xebata bi kom a Hizbên endam li vê navendê de hatine hilgirtin, lê bi sedema hinek pirsgirêkên navxweyî, paş kevt.

Lê li heyvên destpêkiya îsal de Hizba Dêmokrat bo komkirina Hizbên Rojhilat li dora bernameyek hevpar bo careke din pêşdestiyek din kir.

Bi keyfxweşiyê ve ev pêngava ji aliyê din ve pêşewazî lêhate kirin û heta niha çendîn kombûn li ser hatine lidarxistin û dîtingehên bo pêkanîna platformek hevpar bo karê pevre gelek nêzîk bûne, bi hizra min li paşerojek nêzîk de dê bigihîje encama dawî û ev hevkarîkirin dê dest pê bikin.

**Piştî şoreşa "Jîna"yê, gelek hewl ahtine dan ku opozîsiyona Îranê bikare pevre pêngawên hevpar hilgire û alternatîveke siyasî pêş bêxin, lê nekarîn li ser alternatîvek bo paşeroja Îranê lihev bikin. Gelo pisgirêkên bingheîn çi ne ku heta niha jî nehatiye karîn li navbera xwe de paradaymeke nû ava bikin?**

Li rastiyê de nebûna dengê bi kom li navbera hêzên Îranî yek ji sedemên bingehîn a li desthilatmana komara îslamî ye, nebûna vê dengê bi kom jî ji aliyek xelkê Îranê ji paşeroja Îranê piştî nemana komara îsdlamî nigeran kiriye, ji aliyê din ve ew aliyên navnetewî ku dixawzin alîkarder ê herifandina rêjîma Îranê ne, nizanin ku dibe digel kîjan aliyekê danûstandinê bikin.

Bi berçavgirtina vê rastiyê û bi armanca tejîkirina valatiyê, Hizba Dêmokrat çend sal e digel Hizbên ku bibêjim Farsî, li gotûbêjan de ye, lê mixabin me ti serkevtinek bi dest neanî. Ez sedema yê yekê jî li vê yekê de dibînin ku li heyama 100 saslên derbasbûyî de sîstemeke dêmokratîk bo karê pevre li Îranê de nebûye ku xelk hînê diyaloga xwedîberhem û bifermînasîna aliyên beranber bike, lewma her yek ji wan aliyan tevî ku banghêjiya dêmokrasî û dêmokratbûnê dikin, li hundirê xwe de her yek dîktatorek in ku bi tenê xwe û dîtingeha xwe erê dikin.

Armanca min ev e ku xelk hînê karê hevpar nebûne û hizbatî jî li vê sedsalê de azad nebûne. Lê li wî halî de jî, Hizba Dêmokrat li pêkanîna yekgirtina li navbera Hizbên netewên bindest ên Îranê wek Kurd, Ereb, Belûç û Tirkemen de serkevtî bûye. Çend sal e me yekgirtinek a bi navê "Kongireya Netewên Îrana Federal" pêk aniye. Herwisa platforemeke din a bi navê "Yekîtiya bo Azadî û Vekhevî li Îranê" ku me bernameyên hevpar hene, xebata bi dijî rêjîma komara îslamî berdewam dikin.

**Helwîsta Hizba Dêmokrat li derheq hewldanên welatên wek Îsraîl bo bilindkirina hindek kesayetiyên opozîsiyonê ên wek Riza Pehlewî wek serokê aliyên opozîsiyonê çiye? Gelo ev destêverdan, bûne sedema bihêzbûna hevkariya li navbera opozîsiyonê, an dijhevî zêdetir kirine?**

Em li ser vê baweriyê ne ku kesayetiya karîzma bi kar û tekoşîna berdewam, ceribandin û birêveberiya li nav xelkê de serî hil dide, neku bi banghêjiya ragihandinê an li jêr piştevanîkirina welatek an aliyekê.

Riza Pehlewî li nav xelkê de nîne, xwediyê ti hizbek siyasî nîne, ti ceribandinek li birêveberiyê de jî nîne, tenê bi vê hindê ku kurê Hemeriza şah e ku xelkê Îranê 47 sal berî niha, hikûmeta wan herifand. Niha jî ku xelkê Azadîxwazê Îranê li wan heyaman de bi dijî rêjîma paşatî û komara îslamî dehan hezar qurbanî jî dane, careke din rêjîmeke paşatiyê ava nakin.

Bi wan sedeman jî bûna wî rêzdarî neku her alîkarê vekhevî li navbera rêkxiravên opozîsiyon û xelkê nebûye, belku yek ji sedemên zêdetirbûna dijhevî li navbera wan de bûye.

**Li demekê de ku Amerîkayê şiyana navkiya rêjîma Îranê ji kar xist, daxwaza lihevkirinê jî digel rêjîma Îranê dike û Donald Trump li hevdîtina digel "Mihemed Bin Selman" de ev yek dubare kiriye. Gelo Amerîka û welatên Ewropayê, bo vê ku li derheq paşeroja Îranê têgihîştinek ji hev hebe, ti civênek digel we de hebûne? Ev çawa dikarin li derveyê pirsa serbazî bibin sedema çareserkirina pirsa Kurd li Îranê?**

Yek ji nigerniyên Amerêka û Ewropayê, nebûna vekhevî li nav opozîsiyona Îranê de ye û li encamê de nebûna alternatîveke cihê pesendkirin ji aliyê wan welatan û xelkê Îranê ye.

Welatên Rojavayî, nizanin piştî herifîna rêjîmê rewşa Îranê dê bo çi aliyekê ve here, bi taybet wan ceribandinên sernekevtî yên alîkarîdanên bo herifandina hindek ji hikûmetên dîktatorî ên deverê ên wek rêjîma paşatî li Îranê, Beis li Îraqê û heta Efxanistanê jî heye, lewma ez li ser vê baweriyê me ku heta niha welatên Rojavayî nehatine ser vê bawerê ku bernameyek bo herifandina hikûmeta îslamî darêjin, belku hêj kar û tekoşîna xwe li ser danûstandin digel rêjîma Îranê û sepandina xwest û daxwaziyên xwe bi ser de tundtir kirine bo vê yekê ku metirsiyên bo ser deverê û berjewendiyên wan li dever û li wan welatan kêm bikin.

Renge her bi vê sedemê be jî ku heta niha hewldaneke micid bo rûniştin û hevdîtin digel rêkxiravên opozîsiyona Îranê ku Hizba Dêmokrat jî yek ji wan e, bi armanca dariştina bername bo herifandina rêjîêma Îranê, nedane.

**Li heyama çend salên derbasbûyî de, bas ji hejmarek ji gotûbêjên fermî û nefermî hatiye kirin ku li navbera we û komara îslamiya Îranê de hatine kirin, bi taybet, gotûbêjên Osloyê, zêdetir bûne cihê balkêşanê. Gelo niha ti gotûbêjek digel komara îslamî bo lihevkirinê heye?**

Rast e, em vê demê wek Navenda Hevkarî bi navbendçîtiya aliyekî Norwêjî amade bûn ku bi armanca peydakirina rêçareyek bi wec li ser daxwaziyên gelê Kurd gotûbêjan bikin, lê li pêvajoya kar de bo me aşkera bû ku armanca rêjîmê bi tenê heder dana demê ye û ti tiştek din nîne, li encamê de kar bi dawî hat û niha jî ti gotûbêjek li navbera me de nîne.

**Hekî gotûbêj hebin, daxwaziyên bingehîn ên we ji komara îslamî çi ne da ku bikarin digel komara îslamî lihev bikin? Gelo we amadehiya vê yekê heye digel komara îslamî gotûbêjên aşitiyê dest pê bikin wek gotûbêjên aşitiyê li navber Kurd û dewleta Sûriyê û Kurd û dewlete Tirkiyê de bi rê ve diçin?**

Daxwaziya me ji hikûmeta Têhranê ca her hikûmetek be, ev e ku wek niha, hemû desthilata Îranê li Têhranê de neyê qurixkirin, belku ev desthilata bê parvekirin, Kurd û netewên din ên cografiyaya Îranê bi şêwazeke yasayî, li birêvebirina hikûmeta Îranê de beşdar bin û desthilat û birêvebirina hikûmetên xwecihî ji aliyê nûnerên hilbijartiyên xelkê ve be.

Zimanê wan netewan li deverên xwe de firmî be, çalakiyên hizban bi fermî bê naskirin, bi giştî bi hizra me, ev daxwaziyane li Îraneke dêmokjratîk, federal û skolar de dê bêne cî.

Li vê demê de ye ku ev hemû netewane, Îranê bi milkê xwe dizanin û hemû bo avedankirin û pêşxistina vê tekoşînê dikin û tiştek bi navê navend û derdorî, namîne.

# Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bo 5emîn Kongireya Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistana Îranê



**Amadebûyên hêja!**
**Endamên rêzdare Birêveberî!**
**Nûnerên rêzdar ên 5emîn Kongireya Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistana Îranê!**

Li ser navê Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve em gerimtirîn pîrozbahiyên xwe bo lidarxistina 5emîn Kongireya rêkxirava ve ya têkoşer, bo we endamên Kongirê û bi rêya we jî hemû endamên Yekîtiya Jinan dişînin û hivî dikin ku kongireya ve li birêvebirina erkên xwe de serkevtî be.

Bê guman, geşekirina rol û karlêkeriya jinan li pêvajoya çendînalî ya xebata siyasî û civakî de li dîroka serdem, yek ji guherînên binyatî bû ku rêreva jiyana mirovî ji tarîtiya sedsalên navendî ve ber bi pêşkevtin, rewşengerî û şaristaniyeta modern bizivand û şirovekirina dîroka xebata jinan bo dabînkirina vekhevî, azadî û rûmeta mirovî li welatên cîhanê, alîkarderê selimandina vê rastiyê ye.

Li Kurdistanê de jina Kurd ji mêjve wek binyata jiyana civakî, mil bi milê mêran li berhemanîn, kar û xebatê de rol hebûye û mînakên cirîskînên jinên xwedîşiyanên wek "Xanzada Soran, Adile Xanim, Hepsexana Neqîb, Mestûre Erdelan, Cehanaraxanima Paweyî, Qedemxêrxanim û Fatereş û dehan jinên bijartiyên din li dîroka şoreş û tekoşîna siyasî û kultûriya gelê me de diselimînin ku xebata jina Kurd bi dirêjahiya dîrokê ji xebata netewa me bo parastina nasname û dabînkirina serweriyê cuda nebûye.

Bûna jinên wiha, nîşanderê vê rastiyê bûye ku civaka Kurdistanê tevî hebûna hindek nerîtên eşîretî û mêrsalariyê yên berî modernîtê, xebat û berxwedana jinan jî beşa ku nayî înkarkirina rastiyên vê civakê bûye.

Lewma li sibêdeha jidayîkbûna komara moderna Kurd li Mihabadê, rêberên Komarê û Hizba Dêmokrat jî bi têgihîştina îroyîn ji vê potansiyela civaka Kurdistanê bo pêşxistina jinan li pêvajoya jiyana siyasî de pêngawan hildigrin û avakirina vê rêkxiraveya ve ya têkoşer li serdemekê de ku li deverên din ên cîranên Kurdistanê de jin hêj wek kole û xudam û zayenda jêrdest dihate hisêb, dibe wek beşeke gelek girîng li şanaziyên Komara Kurdistanê û Hizba Dêmokrat li berçav bigrin.
Li heyama wan 80 salên piştî Komarê de jî, jinan karîne tevî hemû tepeseriyan û qeyd û bendan, li xebat bo bidestveanîna dadperwerî, azadî û rizgariya netewî de rola berçav hebin û bilî şan û pêgeha wan li hewldan bo pêşxistina civakê û beşdariya çalakaneya wan li tevgera netewî de bûye mînaka herî berçav a bivêrî û têgihîştibûn û hişmendiya jinan li asta cîhanê de jî.

Mînaka herî xuya a vê derheqê de, tevgera Jînayê bû ku her li yekem çirkeyê de bi xwîna paqij a Jîna Emînî, dest pê kir û li berdewamiyê de keç û jinên Kurd, mil bi milê mêran li heyamek kurt de bi durîşma serekiya "Jin Jiyan Azadî" û dirûşmên sembolîkên tevgera netewî-dêmokratîka Kurdistanê, karîn welatê me bikin meydana qehremantiyek mezin û bibin bi pêşengê serhildana seranserî ya hemî gelên Îranê bi dijî kevneperestî û faşîzma komara îslamî.

Serhildanek ku komara îslamî heta ser lêva kendalê herifînê bir û jin li vê tevgerê de ku rêz û bala hemû cîhanê bo aliyê xwe rakêşa, da selimandin ku pêvajoya xebat bo gihîştin bi mirovsalariyê, neînku paşkevt û beşeke derdor e, belku pêşeng û bizvênerê şoreş û guherînê ne û dibe cîhan ji vê têbigihîje ku bervajiyê têgihîştina adetê li civakên Rojhilata nawîn, jina Kurd çav vekirî, bivêrane û bi îradeya polayiya siyasiya xwe dikare rola pêşeng û rênîşander li xebata netewî de hebe û giranî û hitbareke çendqatî bide refên eniya dijî kevneperestî û paşveroyiyê li welatê me Kurdistanê û hemû devera Rojhilata Navîn.

Li rewşek wiha de Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistan Îranê wek rêkxuraveke xwedî pêgeh û bi derbasbûyeke siyasiy a dewlemend ku ji jinên azadîxwaz û dêmokratên netewa me pêk hatiye, dika û dibe jî bi şirovekirina serast û dîtina rastiyan li rewşa siyasî û civakiya welatê me de û hilsengandina meydanên hemûalî, erkê giran a bi rêkxistinkirina herî zêdetir a hewldanên jinan li Rojhilatê Kurdistanê bo dabînkirina mafên taybetiyên xwe wek jin û gihîştin bi asata herî bilinda mafxwaziya netewî û mifahwergirtin ji lêhatîbûn û şiyana jinan li vê pêxemê de li bigirne ustiyê xwe.

Bo vê armancê, gelek girîng e ku hun Kongireya xwe bikin pêgehek bo serkevtin û binyatek qahîm bo darişţina bernameyek qahîm û hilbijartina kesên jêhatî û bi şiyan li birêvebirina vê erkê giran de.

Li vê derheqê de Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê wek pirensîp û baweriya kûr a hertimiya xwe, alîkar û piştevanê hewldanên ve ye, û serkevtina we bi hêvîn û nîşaneya serkevtina xebata rewa ya netewa me û paşeroja rohn bo cîvaka me dizane.

Li dawiyê de careke din, tevî pîrozbahîkirina bi hilkefta destpêkirina 5emîn kongireya rêkxirava we, em hivîdarin ku Kongireya we li rewşeke hevrêtî û dêmokratîk de bi serkevtiyane bi rê ve here û bibe piştevanê bi hêz bo xebata tejî şanaziya jinên welatê me û tevgera netewî-dêmokratîk a Rojhilatê Kurdistanê.

Pîroz be 5emîn kongireya Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistana Îranê
Serkeve xebata mafxwazaneya jinên Kurdistanê bi dijî çewsandin û kevneperestiyê

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**17ê Çiriya Paşîn**

# Daxuyaniya hevpar a bi hilkefta roja cîhaniya rawestan li hember tundûtîjiya dijî jinan

**Xelkê Rojhilatê Kurdistan û Îranê!**

**Jinên mafxwaz!**

25ê November,(25ê Çiriya Paşîn) bîrhênerê xebatek cîhanî bo dawîanîn bi tundîtîjiyên li dijî jinan, xebatek ku bo jinên Îranê û bi taybet bo jinên Kurdistanê, hilgirê wate û manayek berfirehtir e.

Li Îranê de ku pêkhateya siyasî û yasayiya vê li ser binyata cudatîdanîna zayendî hatiye avakirin, tundûtîjiya zayendî neînku her pirsek take kesî, belku beşek ji dariştina siyaseta fermî û alavek bo kontrolkirina civakê ye.

Wek mînak her pêka madeya 630 ya yasya sizadana îslamiya Îranê, destê mêran bo kuştina jinan, vekirîtir kirine. Li vê derheqê de her li sala derbasbûyî de û pêka amaran, zêdetir ji 110 haletên jinkujî û dehan haletên xwekujî û xweşewitandina jinan hatine tomarkirin.

Jinên Kurdistanê dehan sal e digel tundûtîjiyên hikûmî, aborî, çandî û ewlehî rûberû bûne.

Binçavkirin, îşkencekirina jinên çalakvan, bêparkirina wan ji perwerde, pîşe û beşdariya siyasî, siyaseta ewlehîkirina ceste û kincên jinan û tepeserkirina mafê hilbijartin û azadiya take kesî, ji mînakên wan tundûtîjiyên sîstematîk in.

ev reftarane ne tenê rûmet û mafên mirovî yên jinan binpê dike, belku hewlek bo fetisandina dengê nîveya civakê ye.

Lê jinên Kurdistanê li hember wan siyasetan de bi berdewamî xebat kirine û li hember sekinîne û tevgera "Jîna"yê asta herî bilind a vê berxwedana wan bû.

Jîna Emînî li bajarê Têhranê de bû qurbaniyê tundûtîjiya sîstematîka hikûmî ya komara îslamiya Îranê.

Herwisa ev tundîtîjiyên li pêvajoya tevgera Jînayê de bi dijî jinan û keçan hate bikaranîn, ji kuştin, binçavkirin û îşkencekirinê ve bigre heta teqeya rasterast li neraziyan, da xuya ku rêjîma Îslamiya Îranê bo parastina xwe, ji bikaranîna tundîtîjiya bi dijî jinan, xwe naparêze.

Li wî halêî de jî, xebata bivêraneya jinan da selimandin ku ti tepeseriyek nikare îradeya wan bi azadî û vekheviyê ji nav bibe.

Em wek rêkxiravên dêmokratîk û medeniyên Rojhilatê Kurdistanê, li roja cîhaniya rawestan li hember tundûtîjiya bi dijî jinan, radigehînin:

- Em tundûtîjiya sîstematîk a rêjîma îslamiya Îranê bi hemû şêwazên vê ve bi dijî jinan şermezar dikin.

- Em piştevanî li daxwaziyên jinên Kurdistan û Îranê bo azadî, vekhevî û dadperweriyê dikin.

- Li ser hewcehiya pêkanîna mîkanîzmeke serbixwe bo bi belgekirina tundûtîjiyên hikûmî, em piştevanî li qurbaniyan û lipeyketinên yasayî bo tawankariyên hikîmî yên rêjîma Îranê, tekezî dikin.

- Em her cure tundûtîjiyek cîvakî, hundirî û nerîtiya civakî bi dijî jinan şermezar dikin.

Li dawiyê de em radigehînin ku ti civakek bi bê azadî û ewlehiya jinan, azad û aram nabe û "Ne" bi her cure tundîtîjiyek bi dijî jinan dibêjin.

**Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê**

**Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê**

**Navenda Mafê Mirovî bo Rojhilatê Kurdistanê**

**Encumena Girtiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê**

**25ê Novambr a 2025**

# Daxuyaniya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat li derheq biryara Ustraliya bo bi teroristnaskirina spaha pasdaran

**Piştî evê ku roja 27ê Çiriya Paşîn a 2025 de Ustraliyayê ragihand ku wî welatî, spaha pasadaran a rêjîma Îranê wek piştevanê terorîzma hikûmî nas dike û navê spaha pasdaran a terorîst, li lîstê rêkxiravên terorîstî li Ustraliyayê de bi fermî hate Tomarkirin, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê derheqê de daxuyaniyek belav kir ku wihaye:**

Li 27ê Çiriya Paşîn a 2025 de ji aliyê Wezîrê Navxwe û Dadstanê Giştî yê Ustraliyayê ve li daxuyaniyeke hevpar, spaha pasdaran a rêjîma îslamiya Îranê, wek piştevanê terorîzma hikûmî hate naskirin.

Ev biryara dewleta Ustraliyayê piştî vê yekê hate dan ku li sala 2024 de çendîn navend û damezraweyên wî welatî kevtine ber êrîşan û piştre belgeyan da xuya ku ev êrîş bi piştevaniya spaha pasdaran hatine kirin. Li rastî de spaha pasdaran ne tenê piştevanê terorîzmê ye, belku bixwe ji dema hatineserkar a rêjîma îslamiya Îranê ve heta niha, çi li navxweyê Îranê û çi li derveyî Îranê, sedan kiryarên rasterast û nerasterast ên terorîstî kirine û mirov dikare vê mezintirîn rêkxirava terorîstî ya cîhanê bîne hisêb.

Em vê biryara dewlet û dezgeha Dad a Ustraliyanê bilind dinirxînin û wek biryareke serast dizanin, li wî halî de jî em hivîdarin ku dewletên dêmokratîk ên Rojavayî, bi taybet Yekîtiya Ewropayê vê biryar û pêvajoyê ku heta niha çendîn welatên din ên wek Amerîka, Kanada, Biljîk û Ustraliya yê û çendîn welatên din girtine bera xwe, berdewam bikin.



Bi vê yekê dikarin bo terorîzma hikûmî ya spaha psdaran a rêjîma îslamiya Îranê ku rasterast bi fermana Elî Xamineyî yê rêberê rêjîmê kiryaran cî bi cî dike, sînoran dabinên û ewlehî û aramiya navnetewî, biparêzin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**28 Çirriya paşîn a 2025**

# Ji bazên azad re, birîn baskên firînê ne



N. Serbest urmiye


Di dîroka bizava rizgarîxwaziya neteweyan de pir in gavên ku hebûn û wateya mirovbûnê ji nû ve pênase dikin. gavên ku êşa takekesî dibe sembola berxwedana gel.

Di dîroka hemdem a Kurdistanê de ji, canfîdayên rêya azadiyê di vê rêye de derbas dibin û pêgeha mirovahî û mirovbûnê pênase dikin.

xebatkarên ku parek ji laş û heyamek ji saxlemiya xwe gorî kirin, lê rê nedan ku îrade û rûmeta wan û gelê wan bişkê.

Ew ne tenê şervanên li dijî zordestî û dagîrkeran in, belkû parêzvan û bîrhênerên dîrokekê ne ku neteweyekê ji bo parastina kiramet û rûmeta xwe afirandiye.

**1. Birînên ku bûne belgeh bo dîrokê**
Birînên Pêşmerge û şervanên




Kurdistanê belgeyên nenivîsandî yên dîrokê ne, şahidiyên zindî yên ezmûna tundûtûjiya sîstematîk û berxwedan bo parastina nasnameyê li dijî dagîrkeran ne.

Ew du rolên sereke dibînin: ya yekem, şahîdên rastiyên dîroka berxwedanê ne, ya duyem, selimînerê vê  vê rastiyê ne ku îradeya neteweyekê ji bo serxwebûn û azadiyê bi çi trzekê nahê sikandin.

**2. berheqbûna siyaset û berxwedan, parastina şûnasê**
Ji bo şirovekirina kesayetî û pêgeha canfidayên ku endamên laşê xwe gorî rêya azadiyê kirin,  divê ku rewşa siyasî û giştî ya Kurdistanê were şirovekirin.

Gelê Kurd di Kurdistana dagîrkirî de, bi salan e ku li hember siyasetên zordestî, bişavtina neteweyî û talankirina saman û çand û hunera xwe de li dijî dagîrkeran berxwe dide.

Di vê derheqê de jî her pêngavek ku ji bo parastina nasnameya siyasî û neteweyî were havêtin, rengek ji berxwedanê tê hijmartin.

Canfîdayên ku endamên laşê xwe di vê rêyê de gorî dikin, dibin bingehên bihêz ji bo selimandina berheqbûna siyasî u exlaqî ya xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd û sembola xebataê bo nifşên piştî xwe.

**3. Birînên ku dibin rûmet bo mirovan**
Armanc di tevgerên rizgarîxwaziyê de, ne tenê serkeftina siyasî ye, belkû vegerandina rûmeta mirovan, merema serke ye.

Sembola vegerandina vê rûmetê jî canfîdayên nivîşkan yên Kurdistanê ne.

Berxwedana li hember êş û janan û ji nû ve rabûna ser pêyan, daxuyaniyeke herî girîng û pir wate ye ji bo ku bide zanîn ku azadî ne tenê siyaset, belkû hewcehiya mirovahiyê û mirovbûnê ye.




Birînên wan desthilatê bi komek pirsên bingehîn re ber bi rû dikin: Çima divê parastina ziman û nasnameyê bi bihayê tenduristî û jiyanê be?
Çawan neteweyek neçar dibe ku ewqas êşê bikişîne? Ev ew pirs in ku bingeha şirovekirina siyasî ya pirsa Kurd pêk tînin.

**4. Mêrxasên Dilovan**
Yek ji taybetmendiyên xebatrarên nivîşkan ên Kurdistanê dilnizmiya wan e li hember dîrok û gelê wan de.

Ew ji jana birîna ne wekî sermayeyek takekesî, wekî beşek ji sermayeya exlaqî ya neteweyê mêze dikdin.

Ev dilnizmî parêzerê hevsengiyekê ye di civakê de. Xebata wan  berpirsiyariya exlaqî dide nifşan piştî wan û têkoşîna li dijî zordariyê didomîne.

**5. Pêşeroa ku dibê berpirsiyar be**
Ji bîrçûn derdê herî giran e ku gefê ji gelên birîndar dike. Bi bîranîna xebatkarên ku di rêya azadiya gel de nivîşkan bûne, pitir ji erkeke exlaqî, pêdiviyeke siyasî û neteweyî ye û tê wateya parastina dîrokê û nehêştina dubarebûna birînan.

**Encam**
Xebatkarên nivîşkan ên Kurdistanê "bazên azadiyê" ne ku birînên wan ne dawiya rê, belkû destpêka firînek nû ne.

di heman demê de beşek ji dîrok û şûnasa gelê xwe ne, di heman demê de jî stûnên exlaqî yên pêşeroja Kurdistanê ne.

Her gava ku Kurdistan azad be, berhema birînên van bazên birîndar û xwîna hevçeperên wan yên Şehîd e.

## Nerîna



**“Mistefa Hicrî”:**

**“ Me amadehiyeke tevav bo berdewamkirina xebatê û heta xebata çekdariyê jî, heye.”**



**“Vladimir Putin”:**

**“Eger mafê Amerîkayê heye ku sotemeniya me bikire, çima divê Hindistan jî xwediyê heman mafî nebe? Ev pirs hêjayî lêkolîneke bi baldarî ye û em amade ne ku li ser nîqaş bikin, heta bi Serok Trump re jî.”**



**“Tom Barak”:**

**“Tom Barak, nûnerê taybet ê rêveberiya Trump û balyozê Amerîkayê li Tirkiyê, di bersiva pirsek li ser gurhertina rejîmê li Îranê û çima Îsraîlê kar bi dawî nekir de, behsa şerê 12 rojî yê di navbera Komara Îslamî û Îsraîlê de kir û got: “Ez nafikirim ku çîrok bi dawî bûye.””**



**“Matthias Schmale” :**

**“Eger asta wêrankirina kerta enerjiyê aUkraynê berdewam bike û zivistan zêde dijwar be, em di nava karesatê bixwe de rastî karesatekê bibin..”**

# 26 ê Sermawezê ew roj e ku roja Kurdistanê li dijî dagirkeran serket



N. Eskender Ceiferî




26’ê Sermawezê ji bo neteweya Kurd ne tenê rojek asayî ye, belkî rojek e ku dê di bîra netewe ya me de wekî sembola wêrekî, nasname û baweriya bi azadiyê her û her bimîne. Di wê rojê de, Ala Kurdistanê ji hêla Pêşmergeyan ve cara yekem li Mehabadê li paytexta Komara Kurdistanê hate bilindkirin. Ew kêlî ne tenê destpêka ezmûnek siyasî bû, belkî di heman demê de ji nû ve zindîbûna xewnekê bû ku bi salan di çiya, newal û gundên Zagrosê de veşartî bû. Xewna ku Kurd dikarin bi zimanê xwe biaxivin, bi çanda xwe serbilind bin û çarenûsa xwe diyar bikin.

Komara Kurdistanê, bi serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed, ne tenê tevgerek siyasî bû, belkî di heman demê de qîrînek ji dilê civakekê bû ku rastî cudakariya çînî, tunekirina çandî û newekheviya civakî dihat ku ji hêla dagirker ve pêk hatibû. Di rojên ku Îran hîn jî di krîza serdema piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn de bû, Kurdan derfet dîtin ku ji bo cara yekem dewleta xwe ava bikin ku li ser bingeha wekhevî, perwerde û aramiyê bû.

Di demekê de ku Cihû ji aliyê Almanyaya Nazî ve dihatin qirkirin û qurbaniyên Holokostê bûn, Komara Kurdistanê hemû mafên olî û êtnîkî ji bo kêmîneya Cihû ya Kurd saz kiribû. Tevî ku demkurt be jî, ev komar bû xaleke werçerxê ya dîrokî ku ne tenê rêça têkoşîna neteweyî ya Kurdan li xwe de digirt, belkî di heman demê de wekî modêlek ji bo hêza yekem a modêrn di nav neteweyên bêdewlet ên herêmê de xizmet dikir.

Ala Kurdistanê ji aliyê Pêşmergeyan ve hate bilindkirin, lê di rastiyê de Pêşmerge ne tenê hêzek leşkerî bû. Ew, kurên gelê bindest, karker, mamoste, rewşenbîr û hemû beşên civaka Kurd bûn ku bersiva banga Qazî Mihemed dan. Peyva “pêşmerge” di Kurdî de tê wateya “kesek ku li ber mirinê radiweste” û ev wate, ruhê rastîn ê Kurdbûnê di wê demê de diyar dike. Wan ne ji bo pere û desthilatdariyê, belkî ji bo parastina rûmet, nasname û axa xwe çek hildan.

Her yek ji rengên Ala Kurdistanê xwedî wateyek kûr e: kesk ji bo jiyan û deştên bêdawî yên Kurdistanê, spî ji bo hêviya aştî û azadiyê, sor ji bo xwîna şehîdan, roja zêrîn a li navîn ji bo ronahî û hêviyê. Ev roj bîranînek ji bo bi hezaran salan ji rehên şaristanî û çandî yên neteweya li ser vê axê ye. Ji bo neteweya Kurd, ev Ala belgeyeke bawerpêkirî ya neteweyekê ye ku bi berxwedana li dijî siyasetên înkar û asîmîlasyona çandî, xwe zindî hiştiye.

Tevî temenê xwe yê kurt, Komara Kurdistanê projeya parvekirin û birêvebirina erd û milkên giştî bi awayekî ku di serdema xwe de bêhempa bû, pêk anî. Perwerdehiya bi zimanê dayikê, weşandina rojname û pirtûkên Kurdî, damezrandina komeleyên çandî û beşdariya jinan di qada civakî û siyasî de di nav destkeftiyên wê serdemê de bûn. Ji bo cara yekem, jinên Kurd tevlî refên Pêşmerge bûn û di rêvebirina karûbarên bajar de roleke girîng lîstin. Ev xebat, ne tenê nîşanên îdêalîzm û hêviyê bûn, belkî di heman demê de sedemên hewldanên ji bo avakirina civakeke wekhev û zindî bûn.

Lêbelê, ev ceribandina rizgariyê bi dagirkirina Mehabadê ji hêla artêşa Pehlewî ve bi dawî bû. Pêşewa Qazî Mihemed, Serokkomarê Kurdistanê, hate girtin û paşê li gorepana Çarçira ya Mehabadê hate bidarvekirin. Lêbelê, şehîdbûna Qazî Mihemed û hilweşîna Komara Kurdistanê ne dawiya xewna neteweya Kurd bû. Berevajî vê, ew bû çîrokek ku nifşên paşîn ên Kurdan jê waneya Kurdbûnê hîn bûn.

Piştî dehan salan, Ala Kurdistanê hîn jî li çiya û bajarên me dibiriqe. Ev Ala di her xwepêşandanek li dijî dagirkerên Kurdistanê de tê hildan. Her ku ev Al tê bilindkirin, bîranîna wê roja dîrokî zindî dibe.

Îro, di sala 2725’an de, cîhan û herêm di guhertinan re derbas dibin, lê piraniya şert û mercên ku bûne sedema têkoşîna neteweya Kurd hîn jî berdewam dikin. Cudakarî, bêkarî û zordariya çandî û siyasî hîn jî li Rojhilatê Kurdistanê hene. Lê di vê navberê de, 26’ê Sermawezê hîn jî wekî meşxelekê dibiriqe. Di Şoreşa Jînayê de, me dît ku “Jin, Jiyan, Azadî” careke din heman hêvî û armancên ku Komara Kurdistanê li ser wan hatiye damezrandin hatin bîranîn. Di bingeha xwe de, ev dirûşm ji bo wekheviya çînî û mafê diyarkirina çarenûsê diqîre.

Ji bo gelek çavdêran, tevgera neteweyî ya Kurd di heştê salên borî de tenê tevgereke siyasî nebû, belkî di heman demê de beşek ji têkoşîneke berfirehtir li dijî zilm û kolonyalîzmê li Rojhilata Navîn bû. Rêberên wekî Dr. Ebdulrehman Qasimlû, ku hewl dan nasnameya netewî bi xwestekên xwe yên sosyalîstî re hevseng bikin, hîn jî hêviyê didin nifşên nû. Ev nifş dizanin ku ti tiştek nikare bikeve dewsa mafê wan ê xweseriyê.

Îro, Ala Kurdistanê li her çar beşên Kurdistanê, ji rojhilat heta rojava, ji bakur heta başûr, wekî yek ji histûn û sembolên têkoşîna Kurdan li dijî dagirkeran tê hildan. Li gund û bajaran, li zanîngehên mezin, ji bo bîranîna şehîdan û di xwepêşandanên kolanan de, Ala Kurdistanê peyamekê digihîne: Ev Ala ji hêla Pêşmergeyan ve hatiye hildan û kes nikare navê Pêşmerge û Ala Kurdistanê ji dilê neteweya Kurd derxîne. Her cara ku ev Ala dibiriqe, dengê Pêşmergeyan vedibêje ku li Çiyayên Zagrosê jiyana xwe dane da ku ji bo zarokên xwe pêşerojek azad biafirînin.

26’ê Sermawezê, roja Pêşmerge û Ala Kurdistanê, vê rastiyê tîne bîra me ku dîrok ne ji hêla hêzan ve, lê ji hêla neteweyên ku têkoşîna xwe didomînin ve tê nivîsandin. Ev roj vexwendinek e ji bo ciwanan ku bizanin ku azadî û nasname bi berxwedan û hişyariyê dikare were bidestxistin, ne bi çalaknebûnê. Ala ku di zivistana sar a 1945’an de li Mehabadê hate bilindkirin hîn jî dibiriqe ji ber ku roja wê di dilê bi mîlyonan kesan de dibiriqe.

Di vê rojê de, her Kurdek, çi li bajar û gundan be, çi li Çiyayên Zagrosê be an jî di jiyana li derveyî welêt de be, dilê wî ber bi aliyekî ve diçe: Ji bo Mehabadê, ji bo wir ku Ala Kurdistanê ji hêla Pêşmergeyan ve li wir hate hildan û ji bo dengê ku hîn jî dibêje: “Kurdistan dê bi destên Pêşmergeyan were rizgarkirin”.

# Di vê hejmarê de me digel kekê “Bayram Bozyel” Serokê Giştî ê Partî a Sosyalîsta Kurdistanê, li ser piroseya Aştiya di navbera PKKê û dewleta Tirkiyê de hevpeyvîn kiriye.




**Hevpeyvîn: Bayram Bozyel, Serokê Giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê “Bakûrê Kurdistanwê”**

**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh**

**Pirsyar - Sîmîn Rûhanîzadeh: - Piroseya Aştiyê geheştiye çi encamekê?**

**Bersiv –** Rêzdar Bayram Bozyel, Serokê Giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê “Bakûrê Kurdistanê”: Li ser destpêka pêvajoya li Tirkiyê salekî derbas bû.

Rayedrên Tirkiyê Erdoğan û şirîkê wî Dewlet Baxçelî pevajoyanê hanê wek “bêterorkirina Tirkiyê” pênase dikin.

Di vê çarçoveyê da heta anha gelek hevdîtin, hewldan, hatûçûn çêbûn.

27ê Şibatê da Ocalan bangê PKKê kir ku kongreya xwe lidar bixe û biryara çekberdan û xwefeshkirinê bigire.

Meha Gulanê da PKKê kongreya xwe lidar xist û li gor banga Ocalan biryara çeberdanê û xwe feshkirinê da.

Li ser van gavên PKKê li Meclisa Tirkiyê Komisyonek pêkhat daku jibo PKKyîyên ku çekberdane vegerên welat amadekariya îdarî û yasayî amade bike.

Pêşbînî ew e ku heta destpêka sala bê (2026) amadekarîyên pêwîst yên yasayî temam bibin û vegera PKKyîyên çekberdane bo welat destpêke.

**Pirsyar - Piştî peyama Ocelan bo çek danîn û hilweşandina PKK, çi guhertinek hebûye?**
**Bersiv -** Piştî peyama Ocalan, ew gavên ku li jor min eşkere kir hatine avêtin.

PKKê hem di Kongreya xwe ya 12min da biryara çekberdan û xwefeshkirinê da hem jÎ di 12ê Tebaxê da 30 çekdarên PKKê çekên xwe şewitandin daku bawerî bidin aliyê tirkan.

Niha Tirkiye di wê qonaxê da ye ku gelo ew ê jibo çekberdan û xwefeskirina PKKê gavên pêwîst bavêje an na?

Pirsîyar ev în, gelo PKKyîyên çerberdane di bikaribin vegerên Tirkiyê?

Yên bi hinceta alikarîya PKKê di zindanan da ne, dê azad bibin an na?

Yin jiber pêwendîyên bi PKKê ra li Ewropa ne, dê bikaribin vegerin Tirkiyê? Şaredarên ku ji kar dur ketine dê vegerên ser karê xwe?
Pêşdaçûna pêvajoya li Tirkiyê bi avêtina bi van gavan, ango amadekarîya pêkanîna zemina yasayî ve girêdayî ne.

**Pirsyar - Turkiye li hember xwehilweşandin û çekdanîna PKK ê çi pêngavek havêtiye?**
**Bersiv -** Heya niha turkiyê li derheq çareseriya pirsa kurd, çi sozek daye ku li hember wan pêngavên pkk ê de cîbicî bike?

Wek min li jor jî dîyar kir, Tirkiye ev prosesa ku birêve diçe wek “bêterorkirina Tirkiyê” pênase dike.

Di bernameya dewletê da jibo çareserîya pirsa Kurd tu soz an jî bername tune ye.

Erdoğan û Behçelî eşkere dibêjin ku li Tirkiyê bi navê pirsa Kurd tu mesele nemaye. Li gor wan li Tirkiyê tenê pirsa terorê heye.

Ger PKK çek berde li Tirkiyê tu pirsgirek namine. Ev nerîn ji serî heta binî şaş e.

Li Tirkiyê meseleyekê Kurd ya sedsalî heye û heman demê da sê welatên din jî (Îran, Irak, Suriye) dide ber xwe.

Meseleya Kurd bi şerê PKKê destpê nekirîye û bi çekberdana PKKê jî ev mesele ji holê ranabe.

Meseleya Kurd meseleyekê miletekê qedim e. Ev sedsal e ku nasnameya wî hatîye qedexekirin, ziman û çanda wî bûye aramnca pêleke djwar a asimilasyonê.

jibo pêşveçûn û geşkirina hebûna Kurd hemî rê û dirb hatine girtin.

Nesafikirina mesleya Kurd bi rêya aştîyane û demokratik heman demê bûye sedemên qeyranên piralî li Tirkiyê.

Jibo vê em dibijên çekberdana PKKê û dawîanina şer elbete baş e. Çekberdana PKKê dê rewşa siyasi li Tirkiyê nermtir bike, zemina xebata aştîyane û demokratik xweştir bike.

Dê îmkan zêdetir bibin da ku tevgera neteweyî û demokratik a kurdistan li Bakur dengê xwe bilind bike.

Ger em bin meseleya Kurd, ew meseleyekê nbingehîn e li Tirkiyê û divê zutirîn ev mesele li ser esasê wekhevîyê û bi awayekî adîlane bê safikirin.

**Pirsyar - Gelo armanca kûr a vê pirojê û lihevkirina turkiyê û pkk çiye?**
**Bersiv -** Li gor nêrîna me di vê qonaxê da du armancên sereke yên Tirkiyê hene; yek ji çekberdana PKKê, ya diduyan pêşîlêgirtina statuya Kurdên li rojavayê Kurdistanê.

Tirkiye heta anha hebûn û şerê bi PKK ra wek firsendekê bikar dianî.

Tirkiyê bi hinceta PKKê êriş dibirin li ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê, têkoşina azadiya li Bakurê Kurdistanê bi navê terorê reş dikirin û jibo binpikirina mafên gelê Kurd yên rewa hebûna şer îstismar dikir.

Lê piştî geşedanên li Rojhelata Navîn êdî hebûna PKKê dê bibûya problem û asteng. Hêzên wek Amerîka û yên din jî êdî hebûna PKKê naxwazin.

Ji ber vê yekê Tirkiyê mecbûr ma ku meseleya PKKê bi awayekî safî bike. Tiştekî anha dibe jî ev e.

Ya diduya Tirkiye statuya Kurdên li Rojava ji bo xwe wek xeter dibine.

Piştî ruxandina rejima Esad li Suriyê firsendên dirokî derketin peşberê kurdên li Rojavayê Kurdistanê.Ev rewşa hanê çavên Tirkiyê tirisand.

Ji ber van sedeman Tirkiye xwest ku bi destê Ocalan bi SDGê çek bide berdan û wî entegreyê dewleta Şamê bike. Di vî warî da dê Tirkiye bigihije armanca xwe yan na ne dîyar e.

Elbet li dor PKKê jî her diçû çember teng dibû û eşkere bûbû ku êdî PKK bi şerê çekdarî nagihe armanca xwe.

Bi nêrina me ji ber van sedeman ji PKKê ra jî rêyekê din dema, bilî bicîanîna banga PKKê çibo çekberdanê.

**Agirî, Sîmîn Rûhanîzade** - Gelek spas bo kekê Bayram Bozyel Serokê Giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê “Bakûrê Kurdistanê” bo dana wan bersivan.

# Gotinek Di 89 Saliya Rojbûna Prof Dr. Celîlê Celîl De Li Qamişlo



N. Konê Reş

Wek ku diyare, Kurdistan bi çiyayên xwe, hem jî bi şoreş û serhildanên xelkên xwe navdar e...Û tevî qedexebûna zimanê kurdî, perçebûn û bindestiya gelê kurd, gelek lehengên bi nav û deng, di warê nivîsîna bi zimanê kurdî, hunandina helbestan, danheva folklor û weşandina kovar û rojnameyan de, di nav gelê kurd de hatine naskirin...

Eger Bedirxanî di vî warî de ji pêşengan têne jimartin, belê gelek malbatên din jî hene, wan jî di bin şert û mercên çetîn û dijwar de li ber xwe dane û navê xwe bi mêranî di dîroka kurdan de nivîsandine.

Mirov dikare ji wan malbatan malbata Casimê Celîl jî bi nav bike; Ev malbata ku bi ola xwe Êzîdî, di sirgûnê de, xizmet di ber ziman, dîrok, zargotin, çand û medya kurdî de kiriye..

bi dehan pirtûk li dor kêşeya gelê xwe nivîsandine, bi sedan gotar belav kirine û bi hezaran çîrok, çîvanok, metelok, yarî û lîstikên folklorî ji windabûnê parastine, dane hev û çapkirine.

Roja 26/11/2025, (89) sal di ser rojbûna (Prof Dr. Celîlê Celîl) re derbas dibe û piştî meheke din derbasî (90) saliya xwe dibe... Werim! Em di saxiya navdarên xwe de jî wan bibîr bînin..

Ne tenê di mirinê de em wan bibîr bînin û li ser wan bigrîn..!

Bi helkeftina rojbûna Dr. Celîlê Celîl, ez û mamoste Deham Ebdulfettah wek wefadarî ji kar xebata wî re, emê di roja bûna wî de, li Qamişlo, navenda HEEK wî bibîr bînin û temenê wî pîroz bikin.

Ew kurê (Casimê Celil e:1908-1998), yê ku yekî sereke bû di nav rewşenbîrên kurdên Sovyêta berê de û ji ronakbîrên pêşîn bû di nav nivîskar û rewşenbîriya kurdî di Ermenistanê de.

Ew di roja 24/10/1998 an de, li Yerîvanê, komara Ermenistanê çûye ber dilovaniya Xwedê).

Dr. Celîlê Celîl, di roja 26ê meha yanzdan, sala 1936 an de, li bajarê Yêrêvanê Ji dayika xwe çêbûye.

Xwandina xwe a pêşin li wir xwendiye û jîyan û karê wan bi bajarê Yêrêvanê derbaskiriye.

Mala Casimê Celil ji şeş kesan pêk dihat: Casimê Celîl û kebaniya xwe Xanima Celîl û her çar zarokên xwe: Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Cemîla Celîl û Zîna Celîl.

Ji ber ku kurdîtî li bal wan gelekî xurt bû, mala Casimê Celil li Yêrêvanê, di nava behra ermenîyan de wek dibistanek kurdî bû..

Her karê Casimê Celil bi jîyana rewşenbîriya kurdî ve girêdayî bû, dergehe mala wî her dem li ber çûn û hatina kurdan, vekirî bû.

Casimê Celil, evîndarê pirtûkan bû. Bi taybetî pirtûkên ku qala kurdan dikirin, yan jî ku bi zimanê kurdî bana...

Û wiha Celîlê Celîl di gel birayê xwe yê mezin Ordîxanê Celîl û hedû xwîşkên xwe Cemîla û Zînê, di vê mala kurdperwer de hatin xwedî kirin, mezin bûn û di jîyana xwe de li ser rîya xizmeta çand û zanistiya kurdîtiyê fêrbûn û xwe ji vê rêkê dûr nexistin...

Gelek nivîsarên wî yên dîrokî li dervî Ermenistanê jî hatine çapkirin...

Ji bona danheva folklorê kurdî, heftê du rojan; Şemîyê û yekşemê diçû gundên kurdan; Çîrok, stran û destan didanhev û dinivîsandin...

Di salên heyştêyî de, sê caran hatiye nav Kurdên Sûryayê û lêkolînên xwe li ser çand û folklorê wan bi navê (Zargotina Kurdên Sûrîyê) berhev û çap kiriye..

Di havîna 1982 an de, li Qamişlo, ez çav bi Dr. Celîlê Celîl ketim.

Ew yekemîn car bû ku dihat nav kurdên sûriyê.



Ji Heleb û Efrîne dihat û kalemêrekî Ezîdî ji Efînê di gel wî bû.
Di vê carê de, min ew nas kir û bûm wek rêberekî pêre, di gel çend navdarên Qamişlo..

Wiha me tevan dengbêj û çîrokvan jê re komdikirin, ji Silo Koro bigire ta bi Demir Elî, ji pîrejinan ta bi kalemêran ...

Wî jî bê westan, şev û roj dikin yek, û wek zarokê ku çav bi yariya xwe keve, bi şahiyek bê pîvan gotinên wan di nivîsandin û tomar dikirin...
Di sala 1985 an de, careke din di gel kebaniya xwe Gulîzarê hat Qamişlo.

Di vê carê de jî, gelek pêmayê bav û kalan, ji windabûnê dahev û bi xwe re bir.. Di vê hatinê de, min jê pirsî, gelo te zargotina kurdên Binxetê çawa dît ?
Li min vegerand û got: Behreke, min qurtek av jê vexwar û va ez tî vedigerim... Di sala 1988 an de, careke din ew û xwîşka xwe Cemîla Celîl hatin nav kurdên Binxetê/ Cizîrê.

Di vê gerê de jî, gelek stran, metelok, nifir, û destnivîs bi xwe re birin...Di pey van hatinan re, me gelek carên din jî hev dît... Di van hersê caran de, ez pêre bûm, hem jî, ez jê fêrî danheva zargotina kurdî bûm..

Wiha bi saya wî, hezkirina zimanê kurdî bi min re mezin bû..

Roja îro, ez wî wek mamostayekî ji xwe re dibînim di warê eşq û danheva folklorê kurdî de û her dem ez vê yekê tînim zaman.

Fermo nameya wî ku di roja 20/11/2006 ji min re şandiye: (Konê Reş, birazî ! Agirê dilê min ji bona karkirinê hîn gure, apê te xwe kêm nekirye.

Maşalla rewşenbîrên me li Sûryayê jî, îro bûne bi hezara û hemû jî xizmeta xwe ji bona çand û civaka me bi xurtî kar dikin.

Xûşk û birayên hêja ji Kurdistana rojava "Biçûk" ! Dewra xizmeta we mezine, we bi hêz û camêrîya xwe, kurdperwerîya helal li ber xwe vekirye.

Ez meşa we li ser wê rîya ronak pîroz dikim.

Ji sala 1994-a heta niha li Ûnîvêrsîtêta bajarê Wîenayê wek kurdzan, ser ziman, dîrok, çand û edebyeta kurdî kar dike û dersan dide.

Di Akadêmîya zanistiyê de, çend salan lêkolînên xwe li ser kurdzanîyê bi berdewamî kar kirye.

Di înstîtûta Pêdagogîyê de, ji bona amadekirina mamostayên zimanê kurdî, wek kurdolog û dîroknas du sêmêstran dersan daye...

Û niha ew serokê (Institute Kurdology) û pirtûkxaneya (Kurdish Library of Casimê Celîl) ku bi navê bavê xwe li Wîenayê vekiriye.

Em temenekî dirêj di xweşiyê jê re hêvî dikin.

# Ev proje, ji pêvajoya çareserîyê zêdetir, bawerîya ku pêvajoya mijûl kirinê ye xurtir dike



**Mustafa Ozçelîk Serokê PWKyê:**

Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) Mustafa Ozçelîk roja 29.11.2025ê, li paytextê Danîmarkayê Kopenhagê semînerek li dar xist.



Li gel rêvebir û endamên PWKyê yên li Danîmarkayê, nûnerên PDK (Partîya Demokrat ya Kurdistanê), PDK-Îran, HAK-PAR, PDK-Bakur, Komela Şoreşgerê Zahmetkêşanî Kurdistan, Partîya Demokrat a Kurdistan- Sûrîye, Partîya Demokrat a Pêşverû ya Kurd Li Sûrîyê (Partîya Pêşverû), Partîya Demokrata Kurd li Sûrîyê-El Partî, Şepêla Pêşeroja Kurdistana Sûrîye û sîyasetmedar û rewşenbîrên kurd beşdarî semînerê bûn.

PSK û Partîya Yekitî ya Kurd Li Sûrîyê (El Wehda) jî mesaj şandin.

**Naveroka axiftina rêzdar Mistefa Ozçelîk li vê semînarê de wihaye:** ‘’Nuha li pişt derîyan, bi awayekî neşefaf û dizî ku kes nizane çi dibe û dê çi bibe, di navbera Dewleta Tirkîyeyê û Ocalanî de hevdîtin hene.

Bêgûman em li gel çekdanîna PKKyê ne, çekdanîna PKKyê di berjewendîyên gelê me yên her çar perçeyên Kurdistanê de ye.

Em li gel in ku “Mafê Hêvîyê” ji Ocalanî re derkeve, Selahattîn Demîrtaş û hemû girtîyên sîyasî bêne azad kirin, kesayetên ku ji ber fikir û xebatên xwe yên sîyasî ceza xwarine bêne berdan, kesên mecbûr mane welatê xwe terk bikin û gerîlayên ku dê çekên xwe deynin bi awayekî azad vegerin welatê xwe.

Lê mixabin ne daxuyanîyên Erdogan, Bahçelî û rayedarên Dewleta Tirkîyeyê, ne jî daxuyanîyên Ocalanî tu nîşaneyekê naxe destên me ku em vê pêvajoyê weke “pêvajoya aştî, çareserî, demokrasi û azadîyê” pênase bikin.

Em dibêjin nabe ku qedera 30 milyon kurdên li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê di hevdîtinên neşefaf yên di navbera Ocalan û Dewleta Tirkîyeyê de bê hefs kirin.

Divê hemû alîyên sîyasî, sivîl û kesayetên qebûlbar ên kurdan wek terefekî bibin mixetabê Dewleta Tirkîyeyê. Pirs, pirsa miletekî ye, ne tenê pirsa rêxistinekê yan jî pirsa serokê rêxistinekê ye.



Gotin û kiryarên heta nuha, wê bawerîya ku ev pêvajo, ji pêvajoya çareserîyê zêdetir, pêvajoya mijûl kirinê ye xurtir dike.

Dewleta Tirkîyeyê bi erêkirina dewleta kûr ya Tirkîyeyê, bi erêkirina serokkomarê Tirkîyeyê Erdoganî û bi destê Dewlet Bahçelî bi navê ‘’Tirkîyeyeke bê teror’’ projeyek daye destpêkirin.

Bi ya me, armancek sereke ya vê projeyê ev e ku li Rojavayê Kurdistanê bi alîkarîya Ocalanî, rê li ber bidestxistin û parastina statuyeke siyasî û mafên neteweyî yên gelê Kurd bigre, eger ew nebe jî van maf û destkeftîyan di asta herî kêm de sînordar bike û herweha şansa berdewamîya serokkomarîya Erdoganî xurtir bike.

Ez dixwazim li vir de balê bikêşim ser girîngî û pêwîstîya hevkarî û tifaqa neteweyî û niştimanî ya li Bakurê Kurdistanê û kordinasyona tevgera neteweyî ya di navbera her çar perçeyên Kurdistanê de.

Ji bo vê rewş û pêvajoya ku em li Bakurê Kurdistanê tê de derbas dibin, hem girîngîya tifaqa stratejik ya kurdistanî û hem jî girîngîya hevkarîyeke berfireh ya li ser daxwazên acîl ên miletê Kurd hewce ye.

Ez her wekî hertim bang li hemû kadroyên kurdistanî, azadîxwaz û demokrat dikim da ku ji bo avakirina partîyeke milî, demokratî û girseyî li Bakurê Kurdistanê, piştgirîyê bidin siyaset û kultura nû ya PWKyê.

Ez bi micidî careke din, piştgirîya PWKyê ji bo bername û şanda hevbeş ya ku di konferansa bi beşdarîya hemû alîyên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê ku di 26ê Nîsana 2025ê ya li Qamişloyê de hatibû dîyar kirin radigehînim.

Hewceye ku ‘’Îro rojê hemû kurdên cîhanê piştgirîya gele me yê Rojavayê Kurdistanê bikin da ku gelê me bikaribe statuyeke milî, coğrafik, sîyasî bidest bixe’’.

Ez baverim destkeftina federalî ya li Başûrê Kurdistanê weke destkeftek bo hemû kurdên cîhanê tête pênase kirin û girîngî û pêwîstîya avakirina hikûmeteke hevbeş ya ku bikaribe hêza peşmerge, aborî, ewlekarî û dîplomasîya Beşûrê Kurdistanê bike yek, wek mijarek ku rojevê de ye, divê pêngav bo bêne avêtin.

Li deheq Rojhilatê Kurdistanê jî dibe ku bibêjim, li rewşa niha de û li guhertinên deverê de, dikare firsendên dîrokî bêne ber derîyê xuşk û birayên me yên Rojhilatê Kurdistanê jî û ji bo gelê me bikaribe ji wan firsendan feydê werbigre, berîya her tiştî divê hevahengî û yekrêzîya nav mala kurd bê ava kirin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê 25 girtiyên din jî bidarvekirin ku yek ji wan jin e

Pêka dawî raporên belavbûyî li roja 3ê Kanûna Pêşîn, "Pîrwelî Şeibanî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Sebzewarê, "Kêywan Şebexş" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Bemê, girtiyekî ku nasnameya wî nehatiye zanîn li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kenganê û "Elî Kelhur" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Gurganê de hatine bidarvekirin.

Herwisa li vê rojê de "Yûsif Cemşîdî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Benderebasê, "Sefa Cozîpûr" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Gunabadê, "Emîr Îmamî" û 2 girtiyên din ku nasnameya wan nehatiye zanîn li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê li bajarê Kerecê, "Hisam Norûzî" û jinek ku nasnameya vê nehatiye zanîn li girtîgeha Wekîlabad a rêjîmê li bajarê Meşhedê, hatine bidarvekirin.

Herwisa li roja 3ê Kanûna Pêşîn, "Mehdî Cewanmerdî" li girtîgeha Lakan a rêjîmê li bajarê Reştê "Îman Murtizayî û Ebûfeyz Dawûdî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Simnanê de hatine bidarvekirin.

Roja pêştir anku Sêşemî 2ê Kanûna Pêşîn jî "Mihemed Nûrî, Husên Şefîizade û Xulamriza Behramî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Simnanê û "Şumal Mihemedreşîd û Erdelan Husênelî" yên xelkê bajarê Mûsilê li Başûrê Kurdistanê, li girtîgeha Destgird a rêjîmê li bajarê Îsfehanê de hatibûne bidarvekirin.

Roja Dûşemî 1ê Kanûna Pêşîn jî "Ebdulla Berahûyî" naskirî bi "Seyîd Elî" û "Mêhrdad Espîd" li girtîgeha Destgird a rêjîmê li bajarê Îsfehanê, "Husên Zemanî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Durûdê û "Îbrahîm Tebrîzî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Mihabadê de hatibûne bidarvekirin.




Li roja Yekşemî 30ê Çiriya Paşîn jî, "Sipêhr Goderzî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Burûcêrdê û "Perwîz Rîgî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Zahidanê de hatine bidarvekirin.

Rêjîma Îranê bidarvekirinan wek alaveke tepeserkirinê li hember gelên li Îranê bi taybet li hember gelên "Kurd û Belûç" de bikar tîne.

## Kolberekî xelkê bajarê Makoyê ji aliyê hêzên çekdar ên Tirkiyê ve hate kuştin

Roja Sêşemî 2ê Kanûna Pêşîn, "Husên Dewletxwah" ê xelkê gundê Yarmiq ser bi Bajarê Makoyî, li dema kolberiyê li devera sînorî ya bajarê Makoyê û li nava axa Rojhilatê Kurdistanê de bû armanca gulleyên hêzên çekdar ên Tirkiyê û hate kuştin.

Pêka raporan navbirî ji sînorê destkird ên li navera Rojhilatê Kurdistan û Bakûrê Kurdistanê derbas nebûye lê bûye armanca gulleyên hêzên çekdar ên Tirkiyê.

Heta niha rêjîma Îranê li derheq kuştina wî welatiyê Kurd, ti bertekek ji xwe nîşan nedaye.

li sala 1401 a Rojî de jî birayekî "Husên Dewletxwah" ê bi navê "Wehîd Dewletxwah" ku nûgihanekî temen 18 salî bû, li dema kolberiyê de ji aliyê hêzên hêv ên rêjîma Îranê li sînorê bajarê Makoyê de hatibû kuştin.




## Hêzên îtilaata rêjîmê hunermendeka Kurd li Xurasanê binçav kirin

Pêka raporên belavbûyî, hêzên dije mirov yên îtilaata rêjîmê bi awayekî xoserane êrîş kirine ser mala hunermendeka Kurd a bi navê "Esmer Hemîdî" ku sitranbêj û çalakvaneka çandî ye, ew binçav kirine û bo cihek nexuya veguhastine.

Ev hunermend û çalakvana ciwan a Kurd, xelka bajarê Mane û Semelqanê li bakûrê parêzgeha Xurasanê ye ku bi sedemek nexuya ji aliyê îtilaata rêjîmê ve hatiye binçavkirin.

Pêka gotina çavkaniên agehdar, hêzên îtilaata rêjîmê piştî binçavkirina vê hunermend û çalakvana Kurd, ti rohnkirinek li derheq sedema binçavkirina vê hunermenda Kurd nedane û rûpela vê ya li tora civakiya Instagramê, ji aliyê îtilaat rêjîmê ve hatiye daxistin.

Hunermend Esmer Hemîdî bi hest û cilûbergên Kurdî sitran digotin û li rûpela xwe de diweşandin û li nava Kurdên Xurasanê de cihê hezkirina xelkê ye.



# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (507)

